

KELA DIMDIMÊ

XANÊ LEPZÊRÎN

Ordîxanê Celîl - Celîlê Celîl

Weşanên Wardozê • 56 Folklor: 42
Ordixanê Celîl / Celîlê Celîl - Kela Dimdimê, Xanê Lepzêrîn

Edîtor: Bahoz Baran
Redaksîyon: Wardoz
Mîzanpaj: Wardoz
Wêneyê Bergî: Kurdische Reiter, 1892 - Siwarên Kurd

Çapa Ewîl: Gulan, 2023

Çapxane: Bizim Büro Matbaacılık
Zübeyda Hanım Mahallesi 1. Cad. Sedef Sok. 6/1, 06070
İskitler-Altındağ / Ankara
Tel: 0312 229 99 28
Sertifika No: 42488

WARDOZ YAYINEVİ

Navnîşan: Medya Mah. 635. Sokak Welat 412 2. Etap No: 2A Kayapınar -Diyarbakir
© Wardoz Yayınevi - Ordixanê Celîl - Celîlê Celîl
Hemû mafên vê pirtûkê parastî ne, bê destûr nayê kopîkirin.
Ordixanê Celîl, Celîlê Celîl, Kela Dimdimê, Xanê Lepzêrîn, Weşanên Wardozê, Stenbol, 2023

wardozwesanxane@gmail.com
<https://twitter.com/wesanenwardoze>
<https://www.facebook.com/wesanenwardoze/>
www.wardoz.com
978-605-2003-45-9

KELA DIMDIMÊ
XANÊ LEPZÊRÎN

Berhevkar:

Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl



WARDOZ

Ordixanê Celîl, di sala 1932an da, li Ermenistanê li gundê Ūcanê (Nehîyeya Eşte-rekê) ji dayik bûye. Di sala 1956an da pey serhevdaanîna xwendina xwe ya pênc salan li Zanîngeha Rewanê Beşa Fîlolojîyê, wê salê jî di Enstîtuya Dîroka Ermenistanê da bûye aspirant û di sala 1957an da Akademîya Ermenistanê, ji bona amadekirina lêkolîna teza doktorayê ya li ser eposa kurdî "Xanê Çengzêrîn, Dimdim"ê binivîse û xurtkirina zanînen li ser zanyariya folklorê, wî dişîne Lenîngradê (Niha Sankt Petersburg) cem akademîk Î.A. Orbêlî. Di navbera salên sala 1954-57an da, li Radyoya Êrîvanê li para xebirdanên kurdî wekî dîktor û karmendê îtêratûrayê kar kirîye. Ordixanê Celîl, sala 1961ê teza xwe diparêze û navê doktorê zanyariyê distîne. Pey vegera li Rewanê çend salan li Akademîya Zanistîyê da li Enstîtuya Rojhilatzanîyê kar dike û paşê dîsa vedigere Petersburgê û li Enstîtuya Rojhilatzanîyê dibe zanyarê rêber û pê ra jî li zanîngehê wekî dîktor-profesor dixebite heta mirina xwe ya sala 2007an.

Li ser dîroka kurdî, edebîyatê û folklorê kurdan ji 200î zêdetir pirtûk, gotar û berhemên Ordixanê Celîl hene yên li Almanyayê, Swêd, Swîsre, Îraq, Sûriyeyê, Libnan, Îran, Polonya, Rûsya, Ermenistan û li Tirkîyeyê jî dehan zêdetir zimanan hatine çapkirin. Çend pirtûkên Ordixanê Celîlî li ser zargotina kurdan bi rûsî hatine weşandin, yên baldariya xwendavanên Sovyetê kişandine ser xwe, lê pirtûka wî ya bi navê "Stranên Kurda Yên Dîrokê" bi biryara meclîsa zanyariyê ya Enstîtuya Rojhilatzanîyê hatiye pejirandin wekî pirtûka dersê jî bona xwendekarên Îranîzanîyê.

Ordixanê Celîl, endamê fexrî yê Akademîya Zanistî ya Îraqê û ya Herêma Kurdistanê bû, herweha endamê Klûba PENê; Enstîtuya Kurdî ya Parîsê; Yekîtiya Nivîskarên Sovyet û Rûsyayê, endamê Civaka Rojhilatnasên Sovyeta Bêrê û Rûsyayê, endamê Yeketiya Jûrnalîstan li Sovyet û li Rûsyayê bû.

Celîlê Celîl, di sala 1936an da li Rewanê ji dayik bû. Di sala 1959an da li Zanîngeha Rewanê Ya Dîrokê û di sala 1962yan da jî li Enstîtuya Lenîngradê Beşa Zanistên Rojhilatî perwerde bû. Teza xwe ya bi navê, "Di Salên 1850-1880yê Da Têkoşîna Azadiya Kurdistan" di sala 1963an da temam kir. Di sala 1991ê da jî navê doktoraya Habîlîtasyonê ber lêkolîna: "Di Împaratoriya Osmanîyan Da Pêşdaçûn û Qedemgirtina Tevgera Kurdistan a Azadiyê" parast û navê profesoriyê wergirt. Ji sala 1994an heta sala 2009an li Zanîngeha Vîyanayê (Li Enstîtuyên Zimanên Îndo Germanîstîk, Etnolojîyê) li ser ziman, dîrok, etnolojî û çanda kurdan; li enstîtuya perwerdeyê ji bona dersdarên kurdên ku dixwestin mafê mamostetiya zimanê kurdî bistînin, mamostetî kir. Li Akademîya Zanistî a Vîyanayê çend proêktan li ser mijarên kurdolojiyê lêkolîn kirine.

Celîlê Celîl, endamê fexrî yê Akademîya Zanistî ya Îraqê û ya Herêma Kurdistanê ye, herweha endamê Klûba PENê; Enstîtuya Kurdî ya Parîsê; Yekîtiya Nivîskarên Ermenîyan û endamê Civaka Rojhilatnasên Sovyeta Bêrê û Rûsyayê ye. Bûye endamê rêvebirîya Yeketîya Evîndarên Pirtûkan li Ermenistanê; serokê para hevalbendîya "Zanistîyê" yê kurdan. Ew bixwe beşdarî gelek sempozyûm û konferansên hemdinyayê bûye. Di warê folklor û dîrokê da bi dehan pirtûkên wî hatine çapkirin. Li ber keda xwe ya giran di bergeha kurdzanîyê da Celîlê Celîlî, xelata sala 2017an a akademîsyenên kurdên Almanyayê KURD-AKADê wergirtiye.

Li Vîyanayê pirtûkxaneyeka mezin a kurdzanîyê saz kirîye ku tê da pirtûkên cur bi cur hene ku hejmara wan digihîje sî hezarî. Piraniya wan pirtûkan bi kurdî ne û li ser kurd û Kurdistanê ne. Ev çend sal in li ser kuliyata malbata xwe ya folklorê dixebite û cild bi cild hazîrîya çapkirina vê xebatê dike.

NAVEROK

PÊŞGOTIN • 9

BINGEHA DÎROKÎ YA EPOSA KURDAN KELA DIMDIMÊ,
XANÊ LEPZÊRÎN • 19

BEYTA XANÊ KURDA - I • 37

BEYTA XANÊ LEPZÊRÎN - II • 61

XANÊ LEPZÊRÎN KURD - III • 74

HIKAYETA KELA DIMDIMÊ - IV • 100

DIMDIM - V • 118

BEYTA XANÊ LEPZÊRÎN - VI • 142

XANÊ DESTZÊRÎN - VII • 164

DIMDIM - VIII • 174

XAN DIMDIM - IX • 199

XAN DIMDIM - X • 203

DIMDIM - XI • 241

XANÊ ÇENGZÊRÎN - XII • 252

BEYTA DIMDIM - XIII • 261

NOTANIVÎSAR • 273

NIVÎSARNASÎ • 274

NAVRÊZKA BERHEMÊN ORDÎXANÊ CELÎLÎ • 278

FERHENGOK • 284



Ordixanê Celîl (1932 – 2007)

Pêşgotin¹

Eposa kurdan Xanê Lepzêrîn, yek ji baştirîn berhemên sêwirdarîya kurdan a gelêrî ye, zindîbûna egîdîya dîroka şerkarîya gelê kurd e, gelê ku bi sedan salan e di navbera dewletên Tirkîye û Îranê da ji hev parçekirî bûye. Ev berhem neynika daxwazên gelê kurd a herî berfireh e ber bi rizgarîyê û serxwebûnê.

Heykela epîkîyê ya nemir dev bi dev gerîyaye, ji nifşekî derbasî nifşekî nû bûye, heta hatîye gihîştîye rojên me. Yên li ber destê me şaxên Xanê Çengzêrîn ên ji hev cuda ne ku ji alîyê berhevkar û rêwîyan ji zarbêjen kurd û nekurd (yên zimanê kurdî zanibûne) li seranserî Kurdistanê û ji kurdên ku li Yeketîya Sovyetê dijîn hatine girtin.

Demsala dîrokî, ku di eposa Xanê Lepzêrîn da deng vedaye, digihîje dawîya sedsala XVI-an û destpêka sedsala XVII-an, çaxê Kurdistan bi dirêjîya salan di navbera dewleta Îran û Osmanî yê (Tirkîye) da bûbû meydana cengawerîya wan, bûbû sêva di nava hev da parvekirinê.

Kurdistan, ku ser erdê di navbera her du dewletên dijminên hevdu da cih digire, ketibû ber êrişên zordaran yê pirhejmar. Şah Ebasê I-em, serokê Dewleta Sefewîyan, dicehdand ku herêmên welatê xwe yê jihevketî, bi navenda rêveberîya xwe ve baş girê bide, loma dest bi şerê li dijî jihevxitina feodalîyê kir. Bi her awayî kir, wekî hemû mîrîtîyên serbixwe, bi taybetî yê li ser sînorê Tirkîyeyê bigihîne hev. Kurd li dijî hev tevî alandina vî cureyî bûn û ji ber ku armanca şahî ya dawî ew mihokirina kurdan a bi destê zorê bû, rabûn şerê berxwedanê. Kurd li hemberî sîyaseta şahî rabûne berxwedanê û pelçiqîn. Şah Ebasê I-em bi hovîtiya nedîtî serhildana kurdên mukrî di xwînê da gevizand.

1 Bingeha vê nivîsê gotar-lêkolîna Prof. Dr. Ordîxanê Celîlî ye. [Binihêre: O. Dj. Djalîlov. Kûrdskiy Gêroîçeskiy Epos *Zlatorûkîy Xan*. (Eposa Kurda ya Mêrxasiyê Xanê Çengzêrîn). Kratkîyê Coobşçênîya Înstîtûta Narodov Azîi, Nr. 67. Îranskaya Filologîya. Moskova 1963., r. 172-177.]

Gava mirov bi awireka sivik seyr dike, ji mirov tirê naveroka eposa Xanê Lepzêrîn ew ser bûyerên serhildana salên 1608-1610an e ku li başûrrojawayê Gola Urmîyeyê pêk hatiye. Lê di rastîyê da di eposê da behskirina li ser van bûyeran ji çarçoveya behskirina sade gelekî berfîreh derketîye. Ew li ber me radiweste wekî berhemeka dengvedana xem-xeyal û armancên gelê kurd.

Bi eposa kurdan a mêrxasîyê Xanê Lepzêrîn, giringîya berjewendîya civakî û zanyarîyê ya mezin tê raberkirin. Ji ber ku epos riswa dike teoriya gelek zanyarên rojava û rojhilatê, yên li ser kurdan tim nihêrîne wekî ser gelê neserbixwe, wekî ewana berê ranebûne şerkarîyê bona rizgarîya xwe û divê serî jî ranekin ji bona serbixweyî û azadîyê. Epos di roja me da di nava xwe da civandîye nîrxa bîrûbawerî-jêhînbûnê ya mezin. Eposa Xanê Çengzêrîn bingeha xwe ji bûyerên real-dîrokî girtîye û hema bi giştî pey têkçûna serhildanê dest pê kirîye, ji nîveka sedsalîya XVIIan ya diduyan kemla xwe girtîye. Lê dîsa, ku êdî çend sed sal jî derbas bûne, epos di nava giştîya zanyarîyê da û di nava xwendevanan da her maye kêmnaskirî.

Eposa Xanê Lepzêrîn pir naskirî ye li nava gelî. Xelk ne ku tenê hez ji guhdana wê dike, lê bi hurmet û sîyanet nêzîkî wan zarbêjan dibe, yên wê diqedînin. Akademîk Î. A. Orbelî gilî dikir, çawa li Moksê (Kurdistan) nîrx didan ermenîyên dengbêj Ako, ji ber ku ew baş zanibû û digot eposa Xanê Lepzêrîn û xelkê timê bi agahdarîya mezin guh dida ser destanê. Romannivîsê kurdan Erebb Şamîlovî sala 1914an li gundê Sûsîzê (wîlayeta Qersê) bi xwe dîtîye, çawa hemû binelîyên gundî, biçûk û mezin, gava bi-hîstibû wekî Şêx Îsmâîl, ku zehf rind zanibû eposa Xanê Çengzêrîn û êvarê wê bibêje serpêhatîya Kela Dimdimê, hatin civîyan di odeya herî mezin a gundî da û hêvîya hatin û neqîlkirina wî bûn. Xebera ku êvarê wê serhatîya Kela Dimdimê bê gotin, gi-hîştibû gundên doranê, mirovên ku dixwestin zarbêjî bibihîstina, binelîyên gundên cîran jî hatibûn. Dîyarkirina hurmeta li hemberî zarbêjan a eposê ji me ra li hev hatiye em bi xwe bibînin, dema rêya me bi gundên nehîyeyên kurdan ên li Ermenistan, Gurcistanê (li Tîbilîsîyê) û li nava kurdên Ozbekistanê ket.

Qedandina eposa Xanê Çengzêrîn ji aliyê zarbêjan taybetî bûye. Ew ne wekî neqilkirina berhemên ji cureyên mayîn a zargotina kurdan bûye. Vê taybetîyê V. F. Mînskîy,² V. A. Gordlevskîy,³ Î. A. Orbelî, Ereş Şamîlovî û yên mayîn jî destnîşan kirine. Zarbêj tevî behskirinê ne ku tenê bi rêberîya mîmîkan, lê wisa jî bi jestîkulasîya xwe (bi alîkarîya destê xwe, C. C. wergêr) bi destan gotine, lê Şêx Îsmailê li jor navborî bi liv û heja xwe bandora destanê xurt dikir. Ji ber vê jî gundîyan navê wî danîbû Koçek Îsmailê Dîn.

Hêja ye em baldarîya xwe bidin ser wê, wekî dema helbestkî gotina destanê, li hin cihan di bin teqla lihevlêdana dengê du tep-sîyên hesinî da, yên li ser destê zarbêjî bûne, dihatin qetandin. Vê yekê taybetî dida neqilkirina berhemê, wekî dema dîmenên avakirina keleyê û pevçûna kurdan bi leşkerên dijmin ra û yên mayîn.

Eger destpêkirina axaftina dûdirêj li ser zargotina kurdan a cara pêşîn li destpêka sedsalîya XIX-an bû û bi navê X. Abovyan ve tê girêdan, lê bernivîsîna eposa Xanê Çengzêrîn a pêşîn li nîveka diduyan a sedsalya XIX-an, girêdayî bi navê A. Jabayî, konsulê Rûsyaya berê li Erziromê ve dest pê dîke. Şaxa neqilkirina eposê ya pexşanî û pêşîn hatîye nivîsîn û bi wergêra ser zimanê fransî hatîye weşandin, li berhevoka A. Jabayî bi navê Çêrkirinên Kurdî ye.⁴ Di berhevoka (koleksîyon) A. Jabayî da, ku li Fonda destnivîsan a pirtûkxaneyê li ser navê Saltîkov-Şçêdrînî li Lenîngradê (niha Petersbûrg-wergêr) du berhemên helbestkî (264 rêz) ji eposê bi navê “Dastan li Ser cenga Kela Dimdimê bi Qizilbaşan ra, Berhema Feqîyê Teyran”⁵ peyda bûne.

Sih sal bi şûn da pey weşandina şaxa eposê ya pêşîn, sala 1890î li berhevoka *Kurdische Sammlungen*ê, ku Albert Socîn li Petersbûrgê çap kir, ronahî dibîne şaxa eposa Xanê Çengzêrîn a sisêyan

2 В. Ф. Минорский. Курды. Пг., 1915, стр. 16.

3 В. А. Гордлевский. Из жизни курдов. Изв. Кавк. Отд. Имп. Рус. Арх. Об-ва, т. XXII. Вып.

4 А. Jaba, Recueil de notices et récits Kourdes. SPb. 1960. P. 100.

5 Рукописный фонд ГПБ им. Салтыкова Щедрина, колл. А. Д. Жаба, шифры: Курд. 36, стр. 29-34.